

## Li Ser Nerîna Kevneşopî

*Yusuf Uygur*

Di gerdûna mirovan de obje cîhekî girîng digire. Ev objeyên ku paşerojê tîne bîra mirov bi alîyeke din ve şewqa mirov bi xwe ye. Ji yana ku ji objeyan pêk tê û mirov bi xwe jî di nav wê de dijî. Her çiqas di dema niha de be jî, ev yek di nava xwe de rêzedemekî dihewîne. Ev rêzedem wek şirîteke filmekî bûyerên ango bîranînên cur be cur tîne bîra mirov (Assmann, 2001:25). Kevneşopî rêç û “şopek” e. Ev şop carna çanda devkiye ku ew jî fikrandineke ango xwe îfadekirineke cûda ye. “Şop” li ber serê me, cîhê ku em lê dinihêrin, di bedena me de, di nav tiştên ku em dest didin ser de, li derve, li hûndir û li her derê gerdûna mirov dagirkiriye. Ew şopên pirhejmar yê paşerojê...

“Tevahî kiryarên mirovan yê ku di paşerojê de pêk hatine bi tenê bi riya şopên ku dû xwe hîştine tê zanîn. Ev şop car dibe hesiyên ku hatine veşartin li eniyên romayê, carna dibe nêrîngeheke Normana ku bi tenê diwareke ji wê maye, carna jî dibe peyveke nû hatiye keşfkirinê di nivîsên yewnanî ku ev peyv bikaranîna xwe ve fikrekî ango nêrîneke zelal dike. Ev mînakên me anî ziman, nîşanên ango hêmanên kirûyekî bi lebatên hissî ve tîne fehmkirinê ne. Lê bi alîyeke din ve derfeta ku mirov rasterast bigihêje wê kirûyê jî nemaye” (Connerton, 1999:25).

Di salên 1980’ an de gelek zarokên Kurd li gund û bajarên di qada pêşketinê de nebaş ango zêdetir di jîyaneke xwaziyê de mezin bûn. Zarokên wê nîfşê hîn jî şahidên çîrok, wêne û figûrên yê ji demên berê dibûn. Ev tiştên ku şahid dibûn hêmanên çanda devkî ne. Bi rastî ev hêman bi saya serê pêvajoya modernîzma Tirkîyê ya bi lez dihatin ji bîrkirin an jî ji bîrvekirinê bûn. Ev nîfşa ku ez bi xwe jî di nav de mezin bûm, bi şeweyên fikrandinê ya di çanda devkî ve hatiyê hûnandin de û bi şert û mercên an jî bi teşe û awayên ne modern de jîyana xwe derbas kirin. Li bajarên ku em bi zorê an jî bi dilê xwe koç kirin de, me dît ku çawa kal û pîrên me xwe bi kevneşopiyan girtin û bernedan. Ber bi dawîya sedsala 20’an de, ew nîfşên di nav

---

1- Xwendekarê doktorayê yê beşa civaknasîyê li Zankoya Mîmar Sînanê

kevneşopiyan de dijiyan, xwe di nav bombedumanên modernîzma teknolojik ya bilez de dîtin. Bi taybetî salên 1980' an de Kurdên ji gundên xwe koçî gettoyên bajarên mezin bûne zêdetir xwe bi kevneşopîyên xwe girtin. Ev helwesta wan li hember veguherînên bilez ya modernizmê, nêrîna kapîtalîzmê ya bi awayekî hundirê wî vala û homojen demê dihesibîne û dîsa li dijî bi awayekî hovane li her tiştî meta-kirina kapîtalîzmê bû. Li ber van hemu êrîşan koçberan xwe avêtin ber bextê bîra xwe ango bi bîra xwe hembêz kirin. Ji ber ku bîr çiqas dem derbas dibe winda dibû. Bajarên modern û mezin “ di çarçoveya aboriya pere de gerdûnê veguhastine problemeke matematîkî pêdandine” (Simmel, 2006: 89). Bandora van tiştên me vegot tevahî bi awayekî tenêkirin û serêxwekirinê li ser Kurdan bû. Ev tesîr nav Kurdan de di serî de bû sedema xwestina vegera jiyana devkî. Ew tiştê ku dixwestin ango çanda wan a berê ya xwezayî û komî ji bo wan stargeheke germ bû.

“Bîr berî her tiştî li hember bi alîkarîya meta ve tiştbûyîna kapîtalîzmê re wek panzehîreke hêz û jiyani berxwe dide. Bi wi re bîr gaveke girînge ji bo girankirina pêvajoyên kirarî agahîyan; berxwedana li dijî xelandina demê ya di nav senkronizma arşîvan de û ji nû ve bi destxistina şêweyekî fikrandinê ya bê cihana ku ji şibandin, herikandina bilez ya agahîyan û torên qabloyan pêk tê. Paşê bîr di nav gerdûneke bi piroletî agahî lê hatiye barkirin, heterojeneke ku gelek caran gefxwur û mirovan gêj dike û bê hemdemiyê de wekî deriyêke din rola xwe dilîze” (Huyssen, 1999: 19)

Di nav me de ew kesên ku bêhtir modernîst bûn ji van kevneşopiyan nefret kirin. Li gorî wan hewce bû ku civak were “ ronîkirin ” û şêweyên têkiliyên “paşverû” di nav gel de bihata paqijkirinê. Ew kesên ku piştî xwe dabûn hîpotezên teoriyên modernîzma klasîk tiştên kevneşopî wek hovîti û dema wan borî dipejirandin. Bi vî awayî van mirovan demên pêşiyê kevneşopiyan wek rêgezeke dema feodalîzmê û şêweyên jiyana kevneperest dîtin. (Özbek, 2003: 33) Di navbera kevneşopî û van kesên ku me qala wan kir de hîn jî nakokî û pevçûn didomin.

Lêbelê yên bêhtir kevneşopgerên me, kevneşopiyan wek hesreteke romantîk mezinkirin. Li ber çavên wan kevneşopî ew tiştê ku em ji jî pêk tînin “puxt” bi xwe bû. Lewra ji bo ku “puxt” ji destên me neçe ango neyê windakirin, hewce bû ku kevneşopî were jiyandin û parastin. Di nav pêvajoya netewîbûna Kurdan de bi taybetî salên 1990'an de ew kesên ku me li jorê behsa wan kir ango her du aliyên ku kevneşopîyê bi nêrînên cuda dinihêrin kevneşopî birin kirin navenda plansaziya netewîbûna Kurdan. Kevneşopî ji vî demê pê ve li gorî plansazî netewbûna Kurdan hate hilberîn û hîn jî hilberîna wê didome.

Gelo em kevneşopîyê çawa bihesibînin ango çawa bifikirin? Em kevneşopîyê wek forma civakîbûnekî ideal û bêqisur bibînin? An jî bi rêyeke dirêj û zehmet ve em

kevneşopiyê gerdûneke nû ve -utopyaya şoreşgerî- (Löwy, 1999: 219) girêbidin? Bê gûman hewceye ku em kevneşopiyê ji destên tiştêbûyinkirina (metakirin) kapîtalîzmê, kategorîzekirina hişk ya modernîzmê, kevneperestiyê û neteweperestiya bi hov rizgar bikin. Jin û mêr, xizan û dewlemend hwd ji her çînî ew gelê nexwendî û nenîvîsandî, çanda devkî û kevneşopiyan heya îro bi xwe re anîn. Di nava tiştê ku anîn de xwestekên wek maf, edalet, wekhevî ji bilî van dîsa xwazî û hesretên cur be cur yên civakî hene. Xwastekên civakî mîna hestekî, gotinekî û dengê hevpar cîhê xwe di nav kevneşopiyên devkî de digirin. Ev deng û gotinên ku gihîştine roja me divê wek peyamekî wek mizgîniyekî hêz bide utopya şoreşgerî ya pêşerojê, dîsa bêrawestand divê xwe biavêje nav xewnên civakî bêçîn yên guhdarvanên ber qirîn û gaziyan çirokbêjan. Ev peyama ku ji tinebûnê filitiye xwe avêtiye ber bextê me lazim e ku bibe wek stargehekî ango nîşana berxwedanê li dijî tinekirina kapîtalîzmê. Di derbarê vê mijarê de ka werin em berê xwe bidin gotinên Walter Benjamîn;

“Hebûna kevneşopî bi xwe û ew kesên ku kevneşopiyê didomînin ango wergirtine di bin talukeyê de ne. Ew tiştê ku her duyan re jî gef dixwe yek e. Ev gef bêguman listokbûna ango amûrbûna çîna serdest e. Li hember konformîzmê ku ew dixwaze kevneşopiyê bigire û têke destê xwe xebat divê. Ev xebat jî têkoşînekê ku xwe herdem ji nû ve dike ye” ( Benjamin, 2006: 41,42).

#### Şêwazeke Çawa:

Divê xebatên kevneşopiyê nekevin pey lêkolîneke bingehkolîna figureke qerisî û bêrih ya demên berê. Xebat û lêkolînên kevneşopiyê di serî de bi her aliyê ve tiştên niha derdixîne ber çavan. Ew dixwaze ku bîra aktuel bila bê fehmkirin. Ji ber van yekan xebatên kevneşopiyê divê şêwaza bingehkolînê (genealogy) ji xwe re û lêkolînên xwe re esas bigire. Ji bo ku ev têkoşîn bi serkeve hewce ye ku li hemberî êrişê pêdandina tiştê ku wek “gotinên yekîtiyê” tê binavkirin berxwe bide an jî li dijî van gotinan êrişekî bide destpê kirin. Di vê têkoşînê de ji nû ve keşfkirina zanebûna xweser û lokal heye ku ev zanebûn hatiye perçekirin û bindestkirin. Bingehkolîner ji bo ku bi her aliyê ve dema niha derxîne ber çavan ango zelal bike dixebite. Bi vê xebata xwe ve derî li firsandên jiyane hîn hêsantir û dewlemendtir dikin vedike (Mahon, 1992: 100).

## Çavkanî

- Assmann, Jan,(2001), Kültürel Bellek, Ayrıntı Yayınları, İstanbul
- Connerton, Paul, (1999), Toplumlar Nasıl Anımsar, Ayrıntı Yayınları, İstanbul
- Simmel, Georg, (2006), Modern Kültürde Çatışma, İletişim Yayınevi, İstanbul
- Huysen, Andreas, (1999), Alacakaranlık Anıları, Metis Yayınları, İstanbul
- Özbek, Meral, (2003), Popüler Kültür ve Orhan Gencebay Arabeski, İletişim Yayınevi, İstanbul
- Löwy, Michael, (1999), Dünyayı Değiştirmek Üzerine, Ayrıntı Yayınevi, İstanbul
- Benjamin, Walter, (2006), Son Bakışta Aşk, Metis Yayınevi, İstanbul
- Michael, Mahon, (1992), Foucault's Nietzschean Genealogy - Truth, Power, and the Subject, Albany, State University of New York Press